


# BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊD





## BERBANG

Organa Federasyona Komelên Kurdistanê  
Li Swêdê  
Organ för Kurdiska Riksförbundet

**Berpirsiyar**  
Mahmûd Lewendî

**Redaksiyon**  
Bavê Nazê, Cemşîd Heyderî, Dara  
Reşîd, Fehmî Kakeyî, M.Lewendî,  
Mueyyed Teyib, S.Rêving

**Sättning och layout**  
Broyé Macir, Bavé Rojbin

**Adress**  
Box 45205  
S-104 30 Stockholm

**Telefon**  
08/68 60 60

**Postgiro**  
64 38 80-8

**Aboneti/Prenumeration**  
Kes/Enskilda: 100 Skr./sal-år  
Meqam/Myndigheter: 200 Skr./sal-år

**Îlan/Annons**  
Rûpela pašîn/Baksîda: 2000 Skr.  
Rûpelên navîn/Insidor: 1000 Skr.

**Ansvarigutgivare:** M. Lewendî  
**Redaktion:** B. Nazê, C. Heyderî, D.  
Reşîd, F. Kakeyî, M. Teyib, S. Rêving

Redaksiyon ne berpirsiyarê nivîsarên bi îmze û axaftinên Federasyonê ye. Nivîsarên ku ji Berbangê re tên şandin, heke çap jî nebin, li xwedî nayên vegeandin.

ISSN-0281-5699

Sal:7, Hejmar:3/88 (48), 16.03.1988

Merheba ji we re

Sê hefte piştî kongra 8'an a Federasyonê, Komîta Kargêr di nav xwede kar û bar beş kir. Piştî wî bi du heftan jî redaksiyonê civîna xwe çêkir. Redaksiyon hîn di destpêka parvekirina kar û barê xwe de bû, Newroz bi ser de hat û wekî her salî -tu dibêjî qey adet e- me got em jî hejmarekê bigihînin Newrozê. Û me zû kir lez kir û bi sê denga li hevalên "kompiturvan" û "datavan" û "layoutvan" gazî kir; bila sax bin zû bi gazîya mede hatin û welleh piştî xebateke intensîv a 72 saetan, bê westan me ev hejmarê xwe derxist. Û wekî hûn dibînin, me jî Berbang li gor xwe hinekî guherandîye.

Îcar, ez nîza'm ji ku tê; lê wekî ku bûbe adet, piştî her kongreyeke Federasyonê, ji berpirsiyar bigre ta bi redaksiyon û naverok û şiklê Berbangê daxî tê guhertin. Lê, dereng derketina wê, çewt derketina nivîsên wê û salê 12 hejmar derneketina wê hema hema çî bigre qet nayê guhertin.

Bi hêvîya ku em bikaribin hin guhertinan jî di adet û torçyên wê yên ku nayên guhertin de çêkin, bimînin di xweşîyê de.

Berpirsiyar

## BER BI RÊNIVÎSEKE RAST Û YEKGIRTÎ

Bê guman her kurdê ku îro dest davêje qelema xwe û dixwaze bi zimanê xwe tiştina binivîse, yan kesên kitêb, rojname û kovarên bi kurdî dixwînin, hîn ji destpêka karê xwe pêrgî "problema rênivîsê" tên. Nebûna kanûn û prensîbên rênivîsê, ta hevoka dawîyê jî dudilîyê dixwe qeleman û di warê xwendin û nivîsandinê de

tevlîhevîyan peyda dike. Ne pêwîst e ku mirov bibêje; di warê xwendin û nivîsandina zimanekî de yekîti û hevgirtina rênivîsê elfaba têgihîştinê ye. Ji ber vê yekê, çî bi tîpên latînî, çî bi yên erebî, çî bi yên kîrîlî û çî bi tîpine din bîn nivîsîn; hemû miletan ji bo nivîsîna zimanê xwe qanûnîne rênivîsê durist kirine û bi vî awayî jî rê li ber alozî û tevlîhevîyê hatîye girtin.

Îro hema bêje meh ser me re derbas nabe ku em çapbûna kitêbeke nû, yan derçûna kovar an rojnameyeke din nebihîzin. Her rojname an kovarek di warê nivîsê de jî li gor bawerî û dîtinên redaksîyona xwe an jî li ser hinek prensîbên berî wan hatine danan, dimeşin. Weha bûye ku carna li ser tişteki çar an pênc awayên rênivîsê peyda bûne. Lewre jî roj bo rojê, pêwîstîya qanûnên rênivîsê xwe bêtir daye pêş û yên dinivîsin û dixwînin jî bêtir bi vê kêmasîyê dihesin.

Bi ya me jî, ji bo kurmançîya jorî ya bi tîpên latînî têt nivîsîn, roja duristkirina prensîpine rênivîsê hatîye û derbas bûye. Tevî ku **Celadet Bedirxan, Qanatê Kurdo, Kamuran Bedirxan, Reşîdê Kurd an Osman Sebrî** di vî warî de ji me re qanûnîne danîbin jî, heta îro li ser vê rênivîsê yekîtiyek peyda nebûye.

Wek redaksîyona kovareke kurdî, me xwest em ji nuha û pê de li gor zanîn û pêçebûnên xwe serûberekê têxin rîya rênivîsa "Berbang"ê. Ji ber vê yekê em bi dûr û dirêjî li ser vê problemê peyivîn û em gehîştin encamekê ku ji bo Berbang'ê em hinek presîban deynin û li gora wan binivîsin. Û vekirina quncikeke bi navê "**Ber bi rênivîseke rast û yekgirtî**" riyek e ji bo rûniştina van prensîban. Êdî di vê quncikê de endamên redaksîyona Berbangê wê dîtinên xwe û yên redaksîyonên rojname û kovarên kurdî yên din û kesên ku li ser ziman dixebitin pêşkêşî xwendevanan bikin.

Her weha li vê derê divê em bidin dîyarkirin ku li ser hinek tiştan di nav endamên redaksîyonê de du an sê dîtinên cihê peyda bûn. Em wan dîtinên cihê ji bo hejmarên dahatû dihêlin. Lê heta encamên mineqeşe û giftûgoyên li ser rênivîsê, wê Berbang li gor prensîbên jêrîn bête weşandin:

1-Daçek(prepozîsyon):Daçek wê cuda bîn nivîsîn.

Wek:

Kurdistan **di** dilê min **de** ye.

Min nameyek **ji** te **re** anî.

2-Lêker(verb)a BÛN'ê: Li ser nivîsîna "wexta nuha" ya vê lêkerê sê dîtinên cuda di nav me de peyde bûn. Lê belê em gehîştin netîceyekê ku heta dumahîka munaqêşan, lêkera BÛN'ê(ji bo hemû wextên vê lêkerê) cihê bête nivîsîn.

Wek:

Gul **sor e**.

3-Nivîsîna formê negatîf yê lêkeran: Eger rengdêrek an navek bikeve navbera formê negatîf û lêkera BÛN'ê, hingê ew formê negatîf wê cuda bête nivîsîn.

Wek:

Gul **ne** sor e.

Lê ji bo hemû lêkerên din wê formê negatîf bi lêkeran ve bête nivîsîn.

Wek:

Ez xwarinê **naxwim**.

4-Navên ji lêkerên ku ji nav-rengdêr-daçek û lêkerekê besît pêkhatî dizên wê bi hev re bîn nivîsîn.

Wek:

Li ser rênivîsê, **destpêkirina** minaqêşê karekî pêwîst e.

5-Lêkerên ji nav-rengdêr-daçek û lêkerekê besît pêkhatî wê cuda bîn nivîsîn.

Wek:

Li ser rênivîsê minaqêşê **dest pê kir**.

6-Di "wexta berê zûda bihirî" an di "wexta borîya çîrokî" ya lêkeran de paşkoka "**bû**" wê bi lêkeran ve bête nivîsîn.

Wek:

Min xwarin xwaribû.

Min oda xwe paqij kiribû.

7-Eger navên taybetî wek rengdêran bi kar bîn, wê bi tîpa biçûk dest pê bikin (Ji bilî nasnav, sernavê meqalan û navên kitêb û hwd.).

Wek:

Ez **dîyarbekirî** me.

8-Gihanekên wek; da ku, bi çertê ku, ji bilî, li gel, tevî ku, her weha û hwd wê cihê bîn nivîsîn.

Wek:

Ez hatim, **da ku** bixwînim.

**Di gel** vê çendê jî ez çûm wir.

9-Eger navek bi du rengdêran bête teswîr kirin, wê veqetandeka di navbera rengdêran de cihê bête nivîsîn.

Wek:

Şaîrê kurd ê mezin.

10-Eger peyvên bi dengdarên "û" û "î"yê diqedin di cimlê de bîn teswîr kirin, wê ew tîp wek xwe bimînin.

Wek:

Ava kanîya gundê me sar e.

Mûyên serê min gij bûn.

11-Ji bo cudakirina dengên stûr an zirav yê hinek peyvên, wê du tîpên "bêdeng" neyên bi kar anîn.

Wek:

Ew xortekî **pir** baş e.

**Pira** Malabadê pireke kevn e.

Her weha di berhevdana rengdêran de, eger du tîpên "bêdeng" yê nêzikî hev bi hev re hatin, yek ji wan dikeve.

Wek:

Ez ji te **bilintir** im.

Gotina te ji ya min rastir e.

Tiştêkî din, divê em li vê derê bidin dîyar kirin ku nivîsarên ji Berbang'ê re bîn, hemû endamên redaksiyonê li ser hemfikir in kû;

1-Çewtîyên gramerî wê bîn rastkirin.

2-Çewtîyên "stîl"ê wê bîn rast kirin.

3-Devoka nivîskaran wê wek xwe bimîne.

4-Zimanê helbest, çîrok û tekstên folklorîk nayên guhertin.

Em ji xwendevanan hêvî dikin ku bi rexne û nivîsarên xwe pişkdarîya vê mînaqêşe bikin.

Redaksiyon

## Ehmed Arif di "Keşkolî Gîw" de

### Mueyed Teyîb

"Keşkolî Gîw, bergî yekem" navê kitêbekê ye, li Bexdayê hatiye çap kirin. Ev kitêb bi qewarê navincî ye û ji 160 rûpelan pêk têt. Gîw Mukriyanî navekê navdar e, li Kurdistanê başûr, xwedî çapxane bûye û gelek kitêbên giranbiha yê kurdî çap kirine. Di vê kitêbê de ya ku Gîwî amade kirî û keça wî Dr. Kurdistan Mukriyanî pêda çûyî û çap kirî; jînenîgar û helbestên 46 şairên ku navên wan, yan nasnavên wan bi tîpa A yan E dest pê dike, tê de hatiye. Ji şairên kurd yê kurmanç, navê 7 şairan hatiye; Şêx Adî, Ehmed Muxlîs, Ehmed Mîrazî, Eskerê Boyfî, Enwer Mayî, Elho Mayî û navê Ehmed Arif. Nizanim çima navê Ehmedê Xanî û Melayê Cizîrî nehatiye, ji ber ku navê her duwan Ehmed e û navê her duwan bi tîpa E dest pê dike.

Li ser jînenîgara Ehmed Arif tenê ev hatiye nivîsîn; li sala 1927-an li Kurdistanê "Tirkîyê" hatiye dinyayê. Ciwanîya siroştê dewr û berên wî kar li ser kirîye ku helbestan binivîse, li 1959-1962-an li rojname Medeniyet kar kirîye. Paşî ev helbesta jêrî hatiye belav kirin, ku wextê xwe şukur Mustefa li kovara Beyan, hejmara 101-102 belav kirîye. Li pêşekiya wê Ş. Mustefa dinivîse; ev helbest bi kurdî bi dest min ketîye, lê ez nizanim ka E. Arif bi kurdî nivîsiye yan jî bi tirkî nivîsiye û yekî jê ra wergerandiye kurdî. Helbest niha Ş. Mustefa dizane ku E. Arif bi tirkî dinivîse û weke hayê min jê heyî dîwana wî

wergerandiye kurdî-kurmançîya jêrî û eger heta niha nehatiye çap kirin, dê di nîzik da çap bibe.

Ev jî helbesta E. Arif e, ya ku di kovara Beyan de belav bûyî û di keşkolî Gîwî de hatî. (Hin şaîdî di çapa wê de hatine, min rast kirine, M.T).

**Ava Hemrawatê cemidî**

**Çar tîlî li ser ava Dicle,**

**Em ji bîrê ava fire û folan dikişînin**

**Çayê ji berfê dikelînin.**

**Diya min wek şîr vedişêre êşa xwe**

**Dibê; "ba ye, bihar e, derbas dibe".**

**Xwîska min ducanî ye, giran**

**Keçek bedew, te dîtîye**

**Cara pêşîn e, hem vedişêre**

**Hem jî ditirse, dibê: "Ez dimirim".**

**Gewriyek din zêde dibin, em li vê zivistanê**

**Biçûka min!**

**Ez û tu xwe li kû derê veşêrin**

**Xwarziya Ehmed Arif**

**Tu li ser seran têt**

**Li ser çavan.**





## Kongra 8'an a Federasyonê

- \* Nûnerên 11 Rêxistin û Partî û Dezgehên Swêdî û biyaniyan di kongrê de beşdar bûn.
- \* Gelek partî û rêxistinên Swêdî û biyaniya ji Kongrê re mesaj şandin.
- \* 34 Partî û rêxistinên Kurdistanî mesajên serkevtinê bo kongrê şandin.
- \* 92 nûnerên komelên endam beşdarî kongrê bûn.
- \* Kongre bangî hemû hêz û rêxistinên Kurdistanî dike, ku bikaribin cepheyeke Giştî ya Kurdistanî pêk bînin.
- \* Kongre piştgiriya tekoşîna ku li hemû perçên Kurdistanê tê dayîn dike.
- \* Kongre piştgiriya girtiyên zindana Diyarbekirê dike

Roja 13-14 ê meha sibata 1988'an, li bajarê Stokholmê kongra 8'em a Federasyona Komelên Kurdistan pêk hat.

Ji 23 komelên endam 92 nûnerên 22 komeleyan di kongrê de hazir bûn.

Kongre ji alî serokê Federasyonê Hanîfî Celeplî hat vekirin. Piştî kongre ji bo hemû şehîdên Kurdistanê deqeyekê rawesta. Piştî hîlbijartina diwanê li gor rojeva xwe kongrê destpêkir. Endamên diwanê ev kes bûn: Selîm

Babanzade, Elî Zerdeşt, Hesên Mizgîn, Seyran Delal û Reşo Zilan.

Li gor rojeva kongrê, Serokê Federasyonê gotara Federasyonê xwend. Di gotara xwe de bi tevayî behsa rewşa Kurdistanê li her çar perçan, rewşa Kurdên li derve û yên li Swêd û rewşa Federasyonê û rola wê kir.

Piştî ku serokê Federasyonê H. Celeplî axaftina xwe temam kir, li gor rojevê dora axaftina mêvanan bû.

Mêvanên Swêdî û biyanî ku di kongrê de axifin ev bûn:

- 1- Thord Palmlund -(Serokê Daira Biyaniyan ya Dewletê/ SIV)
- 2- Anita Fredên (Li ser navê Partiya Karkerên Sosyal Demokrat Socialdemokratiska arbetarpartiet)
- 3- Staffan Sjöden (Li ser navê Partiya Muhafezekar/ Moderata Samlingpartiet.)
- 4- Hakan Stockhous (Partiya Gel/ Folk partiet)

- 5- Monica Sehlan (Sekreterê Politiki ya Partiya Merkezî/ Center partiet)
- 6- Oswald Söderqvist (Partiya Çep a Komunista /VPK)
- 7- Birgitta Sundström (Komela Navnetewî li Sundsvall/ Internationella Föreningen i Sundsvall)
- 8- Dimitris Boyalota (Li ser navê Federasyona Yunanî/Grekiska Riksförbundet)

## Axafatina hin mêvanan

### Tord Palmlund:

Ji SIV (Daira biyaniyan a Dewletê) silavên germ,

Dema mirov qala gelê Kurd dike, mirov tahde, kuştin, îşkence û canêşandin bi bîr tîne.

Îro li Swêdê nêzî 12 000 Kurd heye. Em ji bo birêxistin û xebata Federasyonê pir dilxweş in û ji ber vê yekê jî sipasî we dikin. Bi ya me ev xebata we ya demokratîk pir girîng e. Me divê her dem were kirin, pêş de biçê û her berdewam be. Daxwaziya me ya herî girîng beşdarbûna jinên Kurd di kar û xebata we de ye. Ez dibînim ku ji vî alî de jî pêşdeçûnek heye.

Niha me giraniya xwe daye ser wê yekê ku bikaribin ji bo biyaniyên ku li Swêdê dijîn kar bibînin, dezgayên nû yên kar vekin.

Lê, rastiyeke jî heye ku, rewşa kar û bar bi rastî ne baş e. Ne ku tenê li Swêdê, her weha li hemû Ewrûpayê. Em dizanin ku hin astengên civakî hene, lê çî dibe bila bibe, emê rê nedin munaqesên negatîf ên ku li dijî wê yekê bin, û emê li dijî wê bixebitin.

Daxwaziya min ev e ku kongra we bi serfirazî bi ser keve. Bimînin di xweşiyê de.



### Anita Freden:

Ez silavên Wezîrê Biyaniyan Georg Andersson pêşkêşî we dikim. Ji ber rewşa welatê we, em dizanin ku piraniya we wê li vê derê bimînin. Ji bervê yekê jî em dixwazin ku hûn roj bi roj tevî civata Swêdê bin û bibin parçeyek ji me. Kar û barên weha jî bi riya xebatên demokratîk û komelayetî dibin.

Ez gelekî sipasî we dikim. Em pir kêfxweş in ku em di nav we de ne. Em gelek dilşad û kêfxweş in ku di demek weha kurt de hûn berfirehtir bûn û hejmara komelên ku endamê we ne zêdetir bû.

Em ji dil dixwazin ku di demek dûr û dirêj de hûn tevî civata Swêdê bibin û em hevûdû qebûl bikin. Bikaribin bi hev re bijîn..

Ez ji we re serkevtinê dixwazim. Em ji kar û xebata we dilxweş in. Sipas û di xweşiyê de bimînin.



- 9- Marko Peura- (Li ser navê Federasyona Finiyan.)  
 10- Hans Göran Frank (Ji partiya Sos.Dem.)  
 11- Jan Westin- (Li ser navê ABF'ê)  
 12- Li ser navê Miljö partiet kesek  
 Li ser navê Enstituya Kurdî ya Parisê ji Hesên Qazî axaftinek çêkir.  
 Partî, rêxistin, dezgeh û kesên ku ji Kongrê re mesaj şandibûn:
- 1- Johan Tiedemann (Sekreterê Federasyona Ciwanên Partiya Moderata)
  - 2- Billy Östh. (Moderata Samlingspartiet.)
  - 3- Anna Karin Berglin (Internationella Föreningen i Sundsvall.)
  - 4- Erol Aydın (Sekreterê Federasyona Komelên Tirkan)
  - 5- Elisabeth Öhmen- Sundsvall.
  - 6- Lennart Bodên (Sekreterê Centerns ungdomsförbund.)
  - 7- Milinko Mijatović- (Sekreterê Federasyona Yugoslawiyan)
  - 8- Yusuf Barkarno (Serokê Federasyona Asûriyan)
  - 9- Gudrun Molander (Serokê buraya biyaniyan li Sundsvall.)
  - 10- Stellan Hermansson (serokê Ciwanên Komunist/ KU)
  - 11- Thord Palmlund- (Serokê SIV)



### Hans Göran Frank

Ez li Tirkîyê bûm. Rewş bi rastî ne baş e. Wisa xuyaye ku hukmeta Tirkîyê bi rehetî tu guhertinekê di heqê gelê Kurd de naxwaze. Hêvî jî neslên dahatû ye.

Ewrûpa gelek zorê dide Tirkîyê, lê mixabin tiştek dernakeve pêş. Lê belê divê em li dij îdamkirinê şer bikin. Divê em muxalefetek fireh pêk bînin.

Çi dibe bila bibe, divê Kurd jî daxwaza xwe ya ji bo serxwebûna Kurdistanê gavên xwe paşde navêjin...

Serkevtina we daxwaziya min e.



**VPK. (Oswald Söderqvist)** Hebûna Federasyonê pir girîng e. Du salên çûyî ewrên reş anîbû ser kurda. Bi taybetî jî di meselekê de ku şik dibirin ser kurda jî.

Helbet kesê ku sûç kirine bê guman divê were cezakirin, lê ev nayê wê manê ku milletek jî were ceza kirin, an têkeve rewşeke xerab...

Rewşa Tirkîyê wek tê gotin nehatiye guhertin. Me wekî her sal daxwaz ji parlamentoya Swêde kir da ku zordariyên hukmeta Tirkîyê protesto bikin, lê mixabin deng ji wan dernakeve.

Şerê Iran û Iraqê dom dike. tiştê herî girîng ku em di şikê de ne, gelo piştî vî şerî, rewşa gelê Kurd ewê çawa be. Divê em piştgiriya gelê Kurd bikin...

Divê em li dij nijadperestiyê jî şer bikin...

Daxwaziya min serkevtina we ye. Spas.

### Center partiet. (Per Granslendt)

Ez pir dilxweş im ku bi we re me. Hûn sal bi sal pêş de diçin. Tiştên ku hûn jî gelê xwe re dikin pir girîng e. Ji ber ku hûn li Swêdê civata xwe temsîl dikin. Swêd welatek wisa ye ku heta nûha dijîtiyên tûj ên civakî derneketiye pêş me. Demeke dûr û dirêj e ku em di nav aşitiyê de dijîn. Ji ber vê yekê jî imkaniyatên me hene ku di kar û xebata we de alîkariya we bikin. Em dixwazin ku hûn bigihên mafên xwe yê demokratîk. Divê em di rewşa navnetewî de zorê bidin Tirkîyê û her weha zorê bidin welatên din jî ku ew jî bikaribin zorê bidin Tirkîyê da ku hebûna Kurda bête qebûl kirin û mafên wan were dayîn...

Divê em li dij nijadperestiyê şer bikin. Pir mixabin ku yekî ji me beyanek da, ku li gel mijadperesta bû. Lê belê divê em meydanê ji wan re nehêlin û tekoşîna xwe bidomînin. Hêzên nijadperest ne tenê li Swêd, li hemû Ewrûpayê roj bi roj zêde dibin. Divê em bi hev re li dij wan şer bikin. Ji ber vê jî divê em hevkarîya xwe xurtir bikin. Em ji bo vî tiştî hazir in. Me divê em di pêşdabirina welatê xwe de cîyê xwe bigrin.

Silavên germîn û spas.



## Hesen Qazî

### Instituta Kurdî ya Parîsê.

Hevalên hêja, Nûnerên berêzî kongrey 8'em.

Be xoşiyewe le xebere bestranî kongrey êwe agadar buyin û sipasî bang hêştintan dekeyn. Bew boneweye baştirin silawî hewpewendî w dostanetan bo denêrin.

Xoşewîstan,

Kongrey êwe le ser bendêk ra pêkde ke gelî Kurd le hemû beşekanî Kurdistan sereray zulm û zor û bend û bestî dujminan le xebat û têkoşan newestawe w bo geyştin be azadî w jîyanêkî bextiyar le fidakarî w xo bextkirdin napirîngêtewe.


Ew helomerce, hereşe le hebûn û ferheng û manewey Kurd erkî ême le derewey wilat çend hênde ziyadtir deka. Wek dezanin êsta le Ewrûpa nîzîkey niw mîlyon Kurd dejn, ewe hêzêkî mezin e, eger rolekenî gelî ême le Ewrûpa bitîwanin be şeweyekî baş xo saz biden, hêzêkî wayan lê pêk de ke çalakane be deng xebatkarani wîlatawe bân. Lew rêbaze da karî ferhengî w sebir û sikene le hast yekdî zemîne xoşkerî rêkkewtin û rêzbestinêkî ewto ye.

Federasyonî êwe le Swêde le mawey 2 salî rabirdû da hengawî zor başî ber ew kokirdinewe w beyekewe sazan û beyekewe çaranî Kurdekani em wîlate helhênatewe. Ême lêre da carêkî dîkeş pîrozbayîtan dekeyn û daway serkewtinî ziyadtirtan bo dekeyn.

Hevalên berêz,

Le kotayî da pêman xoş e mîzgînî bideyn be nwêneran û beşdarani kongrey Federasyon ke Enstîtûy Kurd li Parîs be himmetî Kurdekani danîştûyî Ewrûpay Rojawa w dostî Kurdan tîwanî xanûberew Enstîtû bikirê w malêkî piçûk le xerîbayetî ba gelî Kurd pêkewenê.

Bo le dewrî yek koirdinewey ew kesaney ku lem



karcîrînge da beşdariyan kirdûwe-Enstîtu le êwarey 26 î mangî Fevriyê cejnêkî emegnasi pêk dehênê. Beşdari nwênerani Federasyon lem cejne da cêy pêxoşbûn û geşanewey diîf Şûray Berêweberî Enstîtûy Kurd le Parîs e.

Herbijîn bo xîzmet be Kurd!

Partî, rêxistin û kesên kurd ku mesaj şandibûn:

- 1- Têkoşer -Belçîka
- 2- Yekîtiya Demokratên Kurdistan -Almanya.
- 3- Komitay Amadekirdin -London
- 4- Komkar -Almanya
- 5- Komela Demokrat a Kurdisan - Australya.
- 6- Radyoya Kurdî ( Ş.Bekir) -Australya
- 7- Melbendî Roşinbiri Kurdî- London.
- 8- Hizbi Demokratî Kurdistanî Iran -liqî Swêd.
- 9- Komitey Rêxistinî Yekîti Sosyalisti Kurdistan -Liqî Swêd
- 10- Teverga Sosyalista Kurdistan- Liqî Swîd
- 11- KUK -Rizgarixwazên Netewayên Kurdistan-Swêd
- 12- Koç-Kak
- 13- Ala Rizgarî
- 14- PASOK -Swêd
- 15- Alay Şoriş

- 16- Partiya Hevgirtina Gelê Kurd li Suriyê
- 17- Parti Karkerî Kurdistan (KIP)- Swêd
- 18- Yekiti Niştîmanî Kurdistan liqî Swêd
- 19- Berey Yekgirtûy Dimokratî Kurdistan - Swêd
- 20- Tipi Şanoy Kurdî-Swêd
- 21- Partî Demokratî Gelî Kurdistan
- 22- Partiya Çepê Kurd li Suriyê
- 23- Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan.

Di roja duemin a Kongrê de li ser pêşniyar û guhertina desturê hat axaftin. Piştî munaqesên dûr û dirêj dor hat ser hîlbijartina Komîta Kargêr û Komîta Giştî ya Federasyonê. Piştî hîlbijartinan kongre bi dawî hat. Emdanên Komîta Kargêr a nû ku hatin hîlbijartin jî ev kes in. Keya Îzol, Mahmûd Lewendî, Seyran Delal, Eli Zerdeşt, A. Karamus, Dicle Soro, H. Newroz, Şervan, M. Merd, Qutbettin.



## Em bi hev re rêxistina xwe biparêzin

Kongra 8-em bi aliyên xwe yên baş û nebaş li paş me ma. Gava mirov bixwaze bi kurtî analîza Kongra 8-em bike, mirov bi rehetî dibîne ku aliyên positif bi girantirîn hakîmê Kongrê bû. Ji alî hazîrî, birêvebirin û rêkûpêkiya Kongrê bi miqyas salên borî ve serkeftinek li ber çav hebû. Her weha beşderbûna hemû partiyên siyasî yên Kurdistanê û Swêdî, serokê daîra muhaciran Thord Palmund, parlamenê Sosyaldemokratî Hans Göran Frank, nameyek taybetî ji vezîrê biyaniyan Georg Andersson û gelek mêvanên Kurd û biyanî girîngiya Kongra 8-em teyid dikir.

Hem di nav kurdên Swêdê hem jî di nav bîrûraya giştî ya Swêdiyan de, ji bo Kongra 8-em alaqa mezin hebû. Ev alaqa ne tenê bi Swêd sînorkirî bû, herweha Kurdên li welat û li derveyî welat bi name, mesaj û beşdarbûnên xwe kêfxweşî û slavên xwe ji bo xebatên Federasyonê û Kongra 8-em re nîşan didan.

Çarçova alaqa çiqas fireh bibe, rêxistina me Federasyon ew çend dibe sazûmanekî giştî ku ji alî piraniya Kurdan ve tê qebûl kirin. Ne tenê sazûmanek, lê herweha dibe malê me hemûyan. Herkes, ku di nav xebatên Federasyonê de beşdar dibe, piştgiriya wê dike, girîngiya vê xebatê têgiştîye û dizane, xwedî li Federasyonê derdikeve û hewl dide ku bingehê wê firehtir, hîmê wê bi hêztir be.

Lê, wek her xebatî, wek her tiştî ku Kurd pê mijûl dibin, sazûman, rêxistinên siyasî, bûyer, her çî dibe bela bibe ku di tekoşîna gelê Kurdistanê de rolekî biçûk jî bilîze, ji çavên dijmin nareve. Loma divê em baş bizanibin, dijminên me tu car naxwazin Kurd xwedî sazûman û rêxistinên bi hêz bibin.

Ji ber vê yekê, divê em girîngiya paltforma Federasyonê baş têbigihên, rola ku ew wek rêxistinek giştî dilîze baş tesbît bikin.

1- Îro Federasyon di nav xwe de, Bîrûbaweriyên têvel ya siyasî û Kurdên ji hemû perçên Kurdistanê civandiye li ser hev. Ev xalekî gelek girîng û bi mana ye. Ji bo pêşeroj gevekî hêja ye.

2- Federasyon îro dikare valahiyek di warê otorîta ve tije bike. Ne tenê partiyên me yên siyasî herweha yek yek

şexsên ku xwe paydarê Federasyonê dibîne, jê hêviyek dipê.

3- Federasyon rêxistinek ji bo xizmetêye. Hemû xebatên Federasyonê xizmet ji bo tekoşîna gelê Kurd, xizmet ji bo pîrsgirêkên ferdî ya Kurd e. Û sînore xizmetê pir alî ne. Wek prensîb, deriyê Federasyonê ji bo hemû mirovên Kurd ku ji destê wan kar tê û dixwazin xizmet bikin, rê vekirîye. Divê hevalên me yên ku di organên de cî negirtine, bikaribin ji bo xizmetê amade bibin.

4- Federasyon sazûmanekî resmî ye ku ji alî hemû institusyonên civakî ya Swêdê tê qebûl kirin.

5- Karûbarên Federasyonê di vê perspektivê de ji bo me hemûyan di cîna wext de kaniyê moraleke bilind e. Çiqas karê me baş û pîralî be, çiqas ciddiyet û girîngiya vê xebatê di nav me de belav bibe, ew çend germî û moral di nav kurdan de bilintir û hêztir, hêvî ji bo pêşerojê zêdetir dibe. Lê noxteki dîtir ku gelek girîng e ku divê ji çav nereve:

Federasyon wek rêxistinekî demokratîk, mekanîzma xwe ya kontrolê heye. Hemû organên Federasyonê, ji kongra giştî pêgre heta K.G. û Komîta Karger di nav prosesekî de, girêdayî hevûdû û bi metoda hevûdû kontrol kirine, hevûdû rexne kirin, li gor destûr, prensîb û programa Federasyonê divê çêbibe. Divê mekanîzma demokratîkbûyîne bi her aliyên xwe bête xebitandin. Lê, tenê ji bo armançekî, ji bo hêztirbûna sazûmanê. Herweha di hemû organên Federasyonê de dîsan li gor çarçova jorîn hevûdû rexne kirin, hesabên gurubî yan ferdî divê çêbin. Û tucar, ji ber ku di organên Federasyonê de bûyerên weha çêdibe, nebe asteng li ber xebatê giştî. Munaqaşên Kongra 8-em çî aliyên wê yên baş û nebaş, divê li wir bimîne, nebe bingeh ji bo nexweşiyên nû ku dikare zirarê bide xebatên me. Gelek normal e ku di hemû kongran de, xebata muxalîfetê tê ajotin. Lê piştî kongre xilas dibe ji ber ku awayên Kongra demokratî e û encamê wê me hemûyan girê dide. Divê em munaqaşên nexweş ji bîr bikin û giranî bidin xebata xwe û em bi hevra rêxistina xwe bi xurtî biparêzin. Ev yeka, wek vatîniyek dîrokî li ser milê me gişa ye.

**Keya Îzol**

# Ji me re fedekarî û dilfirehî divê

## Hesen Mizgîn

Kongra Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê di rojên 13 û 14-ê sibatê de pêk hat. Konra 8'emîn jî wek kongreyên din bi teşqele û tevliheviyê derbas bû. Lê cardin jî pêşketinek hebû û helbet ev pêşketinên biçûk dê di rojen dahatû de bibin gavên mezin. Her kongreyek bi xwe re kil û kêmasiyan tîne, valahiyekê derdixe holê. Ev yeka ha bûyereke adetî ye. Lê belê dema mirov gazinên xwe dike û rexneyên xwe peşkeşî derûdora xwe dike, hinek kêma hinek zêde her kes dibêje; "Heval em miletekî paşdamayî ne, welatê me hatiye dabeş kirin û ji ber van sebeban em jî miletek paşdamayî ne û kil û kêmasiyên me û valahiyên me hebin jî pir normal e. Bi van gotinan jî wek xuya dike ku ev normal bûn wê dom bike. Her çiqas ku kil û kêmasî derkevin û valahî hebin, emê bi rehetî bêjin "ev normal e" û jî navê derkevin. Lê bi ya min divê ne wiha be. Divê em jî wek miletê din bikaribin nakokî û astengên ku derdikevin pêşî me bi awakî erînî (posîtîv) jî holê rakin. Divê em hînî federkariyê bibîn. Ji ber ku rewşa ku em têde ne fedekarî divê, nermbûnê divê. Ji ber ku min dizanibû ku eger hin tedbîr neyên stendin, wê di kongra 8'emîn de astengên dijwar derkevin pêş me, ji vê yekê jî min wek endamê Komîta Giştî ya berê pêşniyarek anî. Pêşniyara min bi kurtî wiha bû; "Bila ji bo amade kirina organên Federasyonê Komîta Rawêj komîteyekê ava bibe. Bila ev komîte ji kesên wisa pêk bê ku hemû Kurdên li Swêdê wan qebûl bikin. Di pêşniyara min de amadekirina civînek bi rêxistinên siyasî yên Kurdistanê re jî hebû. Ev herdu pêşniyar bi hev re girêdayî ne. Yek ji wan yekî din temam dike. Lê belê hevalên ku di Komîta Kargêr de bûn di amadekirina civîna bi rêxistinên siyasî de xeletiyek kirin. Armanca civîne bi awakî din pêşkeşî hêzên siyasî kirin. Hêzên siyasî di vê civînê de beşdar nebûn. Ji ber ku gotûbêjen derheq karûbarê Federasyonê, ne karê hêzên siyasî bû. Armanca min jî vê komcivînê ew bû ku bila astengên ku li ber me hene ji holê rabin û em kongreke bê teşqele pêk bînin. Dema ev daxwaz negîşte armanca xwe Komîta Giştî biryara avakirina komîtekê da. Dema ev biryar hate stendin, ji kongrê re mehek mabû. Mehek ji bo karûbarekî wiha dijwar e, bi rastî pir hindik e. Ez dibêjim pir hindik, ji ber ku halê me yê objektîf di ortê de ye. Lê min pêşniyara amadekirina Komîtekê (Komîta Rawêj) 4 meh berî kongra 8'emîn anîbû. Lê pir mixabin girîngiya komîteyek wiha di wextê xwe de nehate fam kirin. Heya niha min tim qala astengan kirin. Gelo astengên ku li pê me ne çi ne? Berê ku ez bersiva vê pirsê bidim, dixwazim li ser girîngiya hebûna Federasyonê rawestim.

Dema rêxistin û hêzên siyasî yên Kurdistanî dest bi avakirina Federasyonê kirin, hêvî dikirin ku hin

karûbarên demokratîk wek çand, folklor, pirsên civakî, pirsar zarok û jinan û h.w.d. ji alî Federasyonê wê bêtin pêk anîn. Her armanc ev bû û ez wisa bawer im ku fedrasyonê kêma be jî li ser van babetan kar û barên hêja kir. Lê pir mixabin wek tiştên me yên din ev kar û bar jî ne temam in, perçe perçe ne. Di pêş Federasyonê de karûbarên pêdivî hene. Karûbarên wisa ku tenê bi awakî merkezi yan jî bi organizasyoneke merkezi tîn bi rê ve birinê. Ji ber vê yekê Federasyon ji ber ku merkezi ye û hemû Kurd tê de cî digrin pêdiviyek e. Baş e çi ne ew karûbarên merkezi? Mirov dikare van karûbaran xal bi xal wiha rêz bike:

- a) Danûstendina bi meqamên Swêdî re.
- b) Xurtkirina têkiliya Kurdên ji aliyê Kurdistanê
- c) Nasandina gelê Kurd bi gelê Swêdî û biyanîyên din re.
- d) Karûbarên çandî û Folklorî.
- e) Bişaftina hin pirs û pirsgirêkên civakî yên ku di civateke nû de derdikevin ber me.
- f) Pirsar jina, zaroka û ciwanan.

Dema mirov ji van xalan hereket bike wê bibine ku gavên ku hatine avêtinê hinde mezin in. Em hêj di destpêkê de ne. Gavên pêş hatine avêtin, lê belê herî girîng ew e ku di cî de raneweste, hêj pêşdetir biçê. Baş e, ev yek bi çi awayî wê bi ser keve? Di vê babetê de jî hin rexneyên min hene;

Berî her tiştî divê rola Federasyonê û birêvebirina wê baş bête fêma kirin. Ev bû du sal ku Federasyon bi awakî herêmî hatiye bi rêxistinê. Lê berê ne wiha bû. Komeleyên ku endamê federasyonê bûn di bin baskê xeteke siyasî de bûn û di kar û bar de cûdakirina kar û barê siyasî û demokratîk bi rastî jî dijwar bû. Bi vê tenê jî nedima; gelek Kurd li derveyî Federasyonê dima. Lê îro 23 komelên ku endamê Federasyonê ne, ji hemû Kurdan pêk tînin. Di van komelan de çi kesên xwedî hêz û çi jî kesên serbixwe û siyasî cî girtine. Ji ber vê yekê jî mirov bi rehetî dikare bibêje ku federasyon malê hemû Kurda ye. Lê cardin hin zîhniyet hene ku dixwazin vê avayiyê hilweşînin, roleke siyasî bidine Federasyonê. Li vir divê ez tiştê girîng ronî bikim. Bivê ne vê her hebûna Federasyonê bi xwe bûyereke siyasî ye. Ji ber rewşa gelê Kurd û Kurdistanê, her gavên ku tînin avêtin an jî gotinên ku tînin gotin siyasî ne. Mebesta min jî peyva "siyasî" ne ew e. Îro bi ya min riya avabûna federasyonê rast e û divê ew avabûn bête spartin. Ji bo vî tiştê minakîyek pir baş heye. Em berê xwe bidin komcivîna ku Komîta Kargêr a berê bi "hêzên siyasî" re pêk anî bû. Komîta Kargêr xwest ku hêzên siyasî li ser kar û barên Federasyonê gotûbêj bikin. Ev xeletiyek mezin bû. Ji ber kugotûbêja li ser kar û barê Federasyonê ne karê hêzên siyasî lê karê komelên



endamê Federasyonê ye. Ev nayê wê manê ku em berê xwe nedin hêzên xwe yên siyasî. Helbet divê em bikin, ji ber ku pêşengiya rizgarkirina Kurdistanê ew dikin û bivê nevwê wê her danûstendin hebe û divê hebe.

Rexneyê duyemîn li ser Kkdira (kadro) ye. Ev çend sal in em dikin nakin kadirên bi rêk û pêk naxin Komîta Kargêr a Federasyonê. Helbet li vir qesda min ne rêk û pêkbûna şexsa bi xwe ye. Na, qesda min ew e ku ew kesên ku bi rastî jî dikarin karûbarê federasyonê bi rê ve bibin, her çi keramet e, yan ew bi xwe naxwazin kar bikin an jî dema kesên wiha tên pêşniyar kirin, kesên din dibêjin "na xêr, eger ev kes hebe ez kar nakin". Divê li vir ez pirsê bikim; ma gelo tiştê ku em nikaribin bi hev re par ve bikin çi ye? Gelo çima însanên me hê jî wek 10 sal berê difikirin? Gelo çima însanên me tehamûla hev û du nakin? Ez bi xwe naxwazim bersiva van pirsan bidim. Lê hêviya min ew e ku her Kurd di serê xwe de bi awakî objektîf li bersiva van pirsan bigere. Dê rojên dahatû meydan ji bo gotûbêja vê babetê veke. Lê tiştêk pirs êşkere ye, hêzên siyasî yên Kurdistanî îro ji do zêdetir nêzî hev dibin. Gav bi gav riya hevkarî, yekîfî û eniya vedibe. Baş e, çima ev tişt di karûbarê demokratîk de nebin?

Îro di nav me Kurda de, yên ku Federasyonê bi awakî rêk û pêk bi rê ve bibin hene. Divê em bikaribin van kesan bînin ba hev. Lê belê ji bo vê kirinê jî nermî, dilfirehî, fedekarî divê. Roj ne roja xeyidandinê ye. Li derveyî Komîta Kargêr an jî Komîta Giştî mayîn nayê wê manê ku mesûliyeta mirov ji ortê radibe. Bi ya min mesûliyeta kesên ku dikarin xizmetê bibin Federasyonê, divê ji Komîta Kargêr û jî Komîta Giştî pirtir kar bikin. Nabe ku mirov bêje; "na xêr, ji xwe ez nehatim hîlbijartinê, ma ezê çima serê xwe têxime belayê, ezê çima êş bixim dilê xwe. Vê carê jî serê min rehet e."

Di vê babetê de rêxistin û partiyên me jî neheqîyek mezin dikin. Kadirên xwe yên ku dikarin di karûbarê federasyonê de ci bigrin, ji bo Federasyonê amade nakin. Dema ku nikarin kadirekî bidine Federasyonê ji ber kesên ku dikarin karûbarê Federasyonê de beşdar bibin, digrin. Divê ne wiha be. Divê mirov ji şirkatiya Federasyonê hereket bike. Kar û barê ku li pêş Federasyonê ne, her yên kurdên me ne, ne yên şexis an jî rêxistina ne.

Rexneyê sêyemîn li ser plankirina kar û barê kongrê ye, ku mirov kongra 8'emîn analîz bike wê bi rehetî bibîne ku nûnerên di kongrê de beşdar bûbûn bê plan û hazîrî hatibûn. Tenê çend nûner bi daxwaz û pêşniyaran hatibûn. Di vê babetê de barek giran dikeve ser Komîta Kargêr û Komîta Giştî. Lê karê herî girîng dikeve ser milê komelên endam. Divê Komelên endam tim û tim

hesaba kongreke nû bikin. Dema wiha be, bivê nevwê Komîta Kargêr û Komîta Giştî tiştên pêdivî dê bîne cih. Meqседа min ew e ku eger komelên endam vatiniyên xwe yên endametî bi ci bînin û federasyonê tim û tim kontrol bikin, wê asteng, pirs û pirsgirêkên me kêmbibin. Kongra Federasyonê ne di du rojan de, lê wê di rojekê de biqede. Ez dixwazim li vir mînakîyek bidim, Komîta Giştî berî kongrê bi 3 mehan hem bi name hem jî bi riya Berbangê hemû komelên endam li ser guhertina destûrê agahdar kir. Lê mixabin ji tu kesi deng dernaket û guhertina destûrê ji vê yekê jî nêzî 4 saet kişand. Her pirsê biryar û pêşniyara ji wiha bû. Divê tiştên wiha ji alî komelên endam ve berî kongrê bêtin amade kirin. Divê tiştên wiha nebin sebebê dirêjbûna kongrê.

Rexneyê çaremîn li ser kar û barê Berbangê ye. Li ser Berbangê, naveroka wê û teknîka wê pirs tişt hatin gotin. Ez li vir naxwazim dubare bikim. Ezê berê xwe bidime komelên endam. Divê her komelek di nav xwe de berpirsiyarek ji bo Berbangê hîlbijêre. Ev kes di be ku ji komîta kargêr be yan i endamek be. Vatiniya berpirsiyarek Berbangê amadekirina nûçeyên komelê ye. Eger her komele li ser kar û xebata xwe raporê bişîne Federasyonê, wê çaxê Berbang dibe malê hemû Kurda. Heya niha me karekî wiha ji xwe re ne kiriye adet.

Helbet divê redaksiyona Berbangê jî berê xwe bide der û ji kesan an jî ji endamên xwe nivîs bixwaze. Nabe ku redaksiyona Berbangê tim û tim li hêviya nivîsa be. Ew dikare bi awakî resmî (fermî) ji hin kesan li ser hin babetan nivîs bixwaze. Wê çaxê barê redaksiyonê jî sivik dibe.

Kongra 8'emîn vatiniyek nû da Komîta Giştî. Ev vatiniya nû li gor destûrê ev e;

"Komîta Giştî berî kongrê bi sê (3) mehan Komîteya Rawêj heldibijêre. Komîta Rawêj ji pênc (5) kesan pêk têt. Komîta rawêj di maweya van sê mehan de divê rewşa Federasyonê û ya komelên endam bide ber çavên xwe. Li gor wê navên endamên ku dê bikaribin bi karûbarên Federasyonê ve rabin, wek pêşniyar tîne kongrê. Nabe ku endamên Komîta Giştî û Komîta Kargêr di Komîta Rawêj de bibin endam."

Bi rastî komîteke wisa wê karûbarê Kongrê hêsan û sivik bike. Lê di vir de cardin komelên endam divê rola xwe bileyzîzin. Bi pêşniyarên xwe alikariya Komîta Rawêj bikin. Da ku organên Federasyonê wek "piyango" bi der neçin. Bila organên Federasyonê bi awakî erfî, zanistî û rêkûpêkî bêtin diyar kirin.

Di dawîya nivîsa xwe de ez dixwazim ji hemû Kurda gaziyek bikim. Em hewil bidin da ku Kongra 9'emîn bi awakî rêkûpêk, bê êş û teşqeke pêk bê.



## Şeva komela demokratîk a jinên kurd li Swêdê

Di 5'ê meha Adarê, 1988'an de li bajarê Stokholmê bi munasebeta 8'ê Adarê roja Jinên navnetewî, Komela jinan şevê amade kir. Di şevê de 400 kes beşdar bû.

Seroka Komelê, Naîle, bi axaftineke Kurdî şev vekir. Piştî wê sekreterê Komelê Hulya ji bi Kurdî li ser giringiya 8'ê Adarê û rewşa Jinên Kurd axifî. Pişt re ji Komîta Karker Zelal ji bi tevayî li ser jinên Kurd û xebat komelê bi Swêdî axifî.

Grûba Silîva ku grûbeke musikê ye, li gel dengbêja Kurd Kulîlk sitranên Kurdî pêşkêşî mêvanan kirin. Piştî wan Folklorî grûpa GOVEND ji bi listikên dorhêla Betlîsê şev geş kirin, piştî wan grûba musikê li gel Beşir Botanî, Îlhamî Can û Gulayê gelek sitranên Folklorîk pêşkêş kirin, di dawiya şevê de hemû mêvanan bi hev re govend girtin.

## Protestoya Jinên Kurd li Stokholmê

Di 19'ê Sibata 1988'ande, ji bo piştgiriya serîhildana Girtiyên Zindana Diyarbekirê, Komela Jinên Kurd li bajarê Stokholmê li meydana sergelstorê civiyan. Nêzî 40-50 jin li meydanê rûniştin. Belavokên bi swêdî belavkirin, pankart vekirin û her weha bangî hemû rojnamevan û radyo û tv. ji kirin. Radyoya Swêdî beşê Tirkî "Merhaba" yê dûr û dirêj qala vê tevgera jinên Kurd kir.

## 8'ê Adarê hat pîroz kirin

Li Stokholmê, li meydana Sergelstorg bi munasebeta 8'ê Adarê Roja Jinan ya Navnetewî hat pîroz kirin. Li gel jinên Kurd gelek kes beşdarî vê pîrozkirinê bûbûn. Wekî tê zanîn her sal di 8'ê adarê de bi alîkariya "Komela 8'ê adarê," roja jinan tê pîrozkirin. Ev komel bi alîkariya 25 Komelên Jinan yê Swêdî û biyaniyan hatiye avakirin ku Komela Demokratîk a Jinên Kurd jî yek ji wan e. Di vê pîrozkirina îsal de li ser navê Komela jinên Kurdan Sema ji axaftinek bi Swêdî çêkir.



# Koma Şêwirdar ya Mezin Civiya

Henîfî

Koma Şêwirdar ya mezin (Stora Referensgruppen) civîna xwe ya yekemîn ya sala 1988-an di rojên 18 û 19-ê Sibatê de li dar xist. Babeta civînê, polîtîka Swêde ya biyaniyan bû. Di civînê de nûnerên hemû Federasyonên biyanî li Swêdê, Daîra Biyaniyan, Hukumetê, berpirsyarê Daîra Jihevveqetandinê

(Diskimineringsombudsmannen), Peter Nobel û berpirsyarê Komisyona lidij jihev veqetandinê Leif Blomberg beşdar bûn. Leif Blomberg, her weha serokê sendikaya Metal e, li ser navê Federasyona me, serokê Federasyonê heval Keya û heval Hanefî beşdar bûn.

Seroke Daîra Biyaniyan Thord Palmlund bixêrhatina mêvanan civîn vekir û li ser guhartinên li daîra Biyaniyan û li ser rewşa penaberan li Swêdê û polîtîka Swêdê ya penaber axaft. Piştî axaftin Thord Palmlund, li gor programa civînê, ku ji berê de hatibû hazir kirin, nûnerê Federasyona Talyaniyan, Antonella Dolci û li ser navê Federasyona Kurda jî Henefî Celeplî dîtînin xwe li serpolîtîka swêde ya Biyaniyan pêşkêş kirin.

Piştî axaftinên Federasyonan, munaqêşe destpêkir.

Heval Henefî di axaftina xwe de bi kurtî weha got:

"Armanca polîtîka Swêdê ya biyaniyan, ku ji aliya parlamentoya Swêdê de biryar li ser hatiye girtin, ev e: Wekhevî, azadiya hilibijartinê û bihev re jiyan e. Bê guman ev armanceke baş e û di vî warî de Swêdê heta niha gavên baş avêtine. Wekî ku biyanî dikarin zimanê Swêdî bê dawê fêr bibin, heta di dema fêrbûna ziman de maaş jî werdigrin. Rêxistinên biyanî tîr teşwîqkirin û alîkariya aborî ji hukumatê digrin, zarokên biyaniyan di dibistanan de bi zimanê xwe yê zikmakî dixwîne ji bo zarokên biyanî mamosteyên zimanê zikmakî tîr perwerde kirin. Hemû biyanî dikarin di xaniyên xweşik de rûnin, di dengdanê belediyê û wîlayetê de biyanî xwedî maf in ku deng bidin û bîr hilibijartin. Biyanî bi serbestî dikarin çanda xwe bi kar binin û pêş de bibim. Bi gelek zimanên biyanî weşanên giştî, wek radyo, televizyon û rojname hene.

Lê divê meriv kifş bike ku gelek kêmasiyên polîtîka Swêdê ya biyaniyan jî hene. Vaye, tê daxwazkirin ku xwendina zimanê zikmakî di dibistanan de ji programa rojê derkeve û têkeve piştî programa rojê an jî rojên şemiyê. Ji xwe her şagirtê di heftê de du saet ders dibîne, gava zimanê zikmakî bimîne piştî programa rojê, wê gelek şagirt nikaribin an jî naxwazin piştî roja dibistanê biçin bixwînin. Ew jî rê vedike ku zarokên biyanî asimile bibin. Gelek ciwanên biyanî ku dibistana Swêdî xilas kirine, ne Swêdî baş dizanin ne jî zimanê xwe yê zikmakî. Ev yeka jî dibe sedemê ku gelek ciwanên ên biyanî nikarin xwendina xwe ya bilind berdewam bikin û herweha nikarin ji xwe ra karekî jî peyda bikin. Divê

hukumet karibe çarekî ji bo pirsê ciwanên biyanî bibîne.

Li bajarên mezin, biyanî li mintiqên diyar hatine komkirin. Li Stockholmê û Göteborgê, gelek mintiqe hene ku ji %50-î bêtir runiştvan biyanî ne. Heta niha di vî warî de polîtîkayeke baş nehatiye meşandin. Ev yeka wê sibêhî gelek problemên mezin derxîne pêşîya me. Di piyasa kar de, gelek caran xwedîkar, kar nadin biyaniyan. Gelek akedemiyonên biyanî, bê kar in. sedemê wê yekê jî, dîplomeyên wan ne Swêdî ne. Hinek caran ewên ku dîplomeyên wan Swêdî ne jî, nikarin kar peyda bikin. Ev polîtîka jihevveqetandinê her pêş de diçe. Divê di vî warî de tedbirên xurt bêne girtin.

Îro polîtîka Swêdê ya biyaniyan bûye yek ji qadên tesarufkirinê. Ev yeka xeter e. Eger ji butça biyaniyan îro bê tesrûf kirin, bihayê wê sibêhî wê girantir be."

Di munaqêşan de, gelek rexne li polîtîka Swêde ya biyaniyan hate girtin. Barpirsyarê Daîra Biyaniyan bersiva hinek rexna dan û bi xwe jî tevî rexnan bûn. Lê hemû rexne hatin protokollkirin da ku li ser bête derskirin.

Roja duduyan jî, Peter Nobel û Leif Blomberg li ser xebatên xwe bi firehî aqêdarî dan. Herduyan jî diyarkirin ku her çend, rasîzm li Swêdê ne ewqas xurt be jî, divê hêzên demokrat û pêşverû li di rasîzmê bi xurtî bisekinin û rê nedin ku rasîzm pêş de here. Leif Blomberg bêtir rola sendiqayan di vî warî de anî zimên. Peter Nobel jî, ji tunebûna qanûnên xurt li dijî rasîzm gazin kirin. Ewî, "Ez pilingeke bê diranim" got.

---

## KOMELA KURD LI JARFALLA

Komela Kurd li Jarfalla, bi hevkarîya "ABF"ê projek amade kir. Li gor vê projê Komela Kurd li dibistanên li Jarfalla, Upplandsbro û Upplandsvasby derheqê kultura Kurdî û Kurdistanê de, dê agahdarîyan bidin.

Li gel vê xebatê di 28.02.1988'an de li dibistana Kalltorpskolanê ji bo şagirdên sinifa nehan diabilid hat nîşandan û bo 150 şagirdên Swêdî, derheqê kultura Kurdî û Kurdistanê de agahdarî hate dayin. Di vê rojê de grûba folklorê; DÎLAN govendên xwe pêşkêşî hemû kesên beşdar bûbûn kir. Ev roj bi awayekî gelek baş derbas bû.

Berpirsyarê dibistanê dan diyarkirin ku rojên weha di demên pêş de jî were amade kirin.

**Komela Kurd Li Jarfalla  
Komîta Kargêr**

---



## ŞAHÎYA DAGHEMA KURDÎ

Di 5'ê meha Sibata 1988'an de Daghem(Kreş)a Kurdî ya Tenstayê programek şahîyê ji bo zarokên swêdîyan li Vallingby'ê pêşkêş kir. Di vê şahîyê de nêzî 80 kes beşdar bûn. Zarokên DagHEMA kurdî ku di nabêna 4-6 salî de bûn, bi sitranên kurdî û swêdî û govend û dîlanên xwe yê xweşik şahîya xwe geş kirin. Li dûmahîkê, li ser navê hemû zarokên swêdîyan keçeke 4 salî gul li zarokên kurda belav kir. Piştî nan xwarina bi hev re şahî xelas bû.

## LI TROLLHÄTTAN

## ŞEVEKE KULTURÎ

Komela Kulturî ya Kurdistanî li bajarê Trollhattan'ê, di 27. 02. 1988'an de şeveke mezin a kulturî amade kir. Li gel Kurdan her weha gelek mêvanên Swêdî û biyanî jî di şevê de beşdar bûn. Li ser navê Federasyonê jî heval Cemîl di şevê de beşdar bû.

Di şevê de musabeqa ciwantirîn cil û bergê kurdî yê jinan hat çêkirin.

Rojname û kovarên Swêdî yê roja din hemûyan li ser vê ahengê nivîsîn.

## ŞAHÎYA NEWROZ'Ê Li LINKÖPING'Ê

Komela Kurd li Linköping'ê di 26'ê Adara 1988'an de li bajarê Linköping Newrozê pîroz dîke.  
wext: 26. 03. 1988, seet: 17.00  
cih: Folkungaskolan, Matsal-  
aula, Folkungagatan, Linköping.

## ÊWAREYÊKÎ KURDÎ

Le ser dawakarîy Xaçî Sûrî Vesteras, le rojî pêncşemey rêkewtî 04.02.88 katjimêrî şeşî paş nîwero le lokalî Xaçî Sûr êwareyêkî Kurdî saz kira. Nûneranî zor le rêkxirawe cihanîyekanî şarî Vesteras çend kesanî tir beşdarî ew êwareyan kird.

Lew êware Kurdîye da basêk derbarey Kurd û barî Kurd le Kurdistan pêşkêş kira w welamî pirsyarekan dirayewa w beşdaran xoşhalî xoyan derbirî ke zanyarîyêkî başîyan derbarey Kurd wergirt û dawayî zîyatir be yek gehîştinîyan kird bo zîyatir zanyarî derbarey barî Kurd la Kurdistan. Paşan kutayî be êwareke hêndira w supasî beşdaran kira.

Komeley Kurd Le Vesteras  
Serko Emîn

## SEMÎNEREK LI SPÅNGA'YÊ

Di 07. 02. 1988'an de li Tenstayê semînerê ji alî Bavê Nazê ve hate dayîn. Bavê Nazê di vê semînerê de bi taybetî li ser her du kitabên xwe "Stokholmê te çi dîtîye bêje" û "Hêsir û Baran"ê sekinî, her weha bersiva hin rexneyên ku li ser kitêbên wî hatibûn nivîsîn, da.

Komela Kurd Li Spånga

## KURSA ZIMANÊ KURDÎ

Komela Kulturî Kurdistan Li Trolheten, bi alîkariya ABF'ê li Trolheten'ê kursa zimanê Kurdî (Kurmançî) amade dîke. Ev kurs bi taybetî bcwan kurdên ku bi zaravê Kurmançîya Xwarû (Sorani) dizanin, û her weha bo wan kesên ku bi kurdî nizanin hatiye amade kirin. Her kesê ku dixwaze di vê kursê de beşdar be dikare serî li komelê xe.





## Civînek bi Daîra Biyaniyan a Dewletê (SIV) re

Daîra 'Biyaniyan ya Dewletê, Federasyona me di roja 5.2.1988'an de vexwende civînekê. Civîn li Bajarê Norrköpingê di lokalên Daîra Biyaniyan de pêk hat. Li ser navê Federasyonê, pênc heval beşdar bûn.

Civîna ku di saet 10. de dest pêkir û saet 16.00-an de qediya, ji du beşan pêk hatibû. Beşa yekemîn, karûbarê Federasyonê û rewşa kurdan li Swêdê bû. Di vê beşa civînekê de nêzîkî 50 xebatkarên Daîra Biyaniyan ji seksiyonên têvel beşdarbûn. Destpêkê de nunerên Federasyonê, li ser rewşa kurdan û li ser karûbarê Federasyonê aghdarî dan, beşdarên civînekê pirsiyarên

xwe kirin û bersiv wergirtin. Beşa yekemîn du saet berdewam bû. Piştî nîvro, beşa duemîn ê civînekê bi berpirsiyarên seksiyona tevgera geleri (Folkrörelse seksionen) dest pê kir. Di vê beşê de jî berpirsiyarên Daîra biyaniyan li ser rêxistinîya xwe ya nû aghdarî dan numerên Federasyonê û Daîra biyaniyan bi dût û dirêjahî hate sekînin. Ji bo zarok, ciwan û jinên kurd hinek xebatên konkret hate tespît kirin ku Daîra Biyaniyan û Federasyon bi hev re bikin.

Di dawîya rojê de, nunerên her du alîyan jî diyar kirin ku civîn bi serfirazî derbas bû.

### PROTESTOYA 26 FEDERASYONAN

Pêşniyarek heye ku hukmata Swêdê dixwaze dersên zikmakî ji şema mektebê derxe, bike wek dersekî serbest î derveyî wextê mektebê, ji ber vê yekê 26 federasyonên biyaniyan li Swêdê, nivîsek ji bo protestokirina vê dîtînekê belav kirin û ji hemû rêxistin û rojname û ji parlamentaran re şandin. Her weha li ser navê wan, 3 kes jî dê biçin li gel Wezîrê Perwerde yê Swêdê biaxifin. Federasyona Kurda jî di vê protestoyê de bi awayekî tund ciyê xwe girtîye. Li jêrê em navê wan Federasyonan dinivîsin:

1-Federasyona Asûrîyan, 2-Federasyona Erîtreî, 3-Federasyona Estî, 4-Komîta Estî,5-

Federasyona Fînî-Swêdî, 6-Federasyona Grêkî(Yûnanî), 7-Federasyona Îslândî,8-Federasyona Multeciyan, 9-Federasyona Îtalî, 10-Federasyona Yugoslavî, 11-Federasyona Xirvatî, 12-Federasyona KURDÎ, 13-Federasyona Lettî, 14-Kongra Polonî, 15-Federasyona Portekîzî, 16-Federasyona Fînî, 17-Federasyona Jinên Biyanî ya Navnetewî 18- Federasyona Polonî, 19-Federasyona Îspanî, 20-Federasyona Suryanîya, 21-Federasyona Tirka, 22-Federasyona Macarî, 23-Federasyona Japonî, 24-Federasyona Multeciyan Li Boros, 25-Federasyona Salvadorî, 26- Federasyona Şîlî.

### BÎRANÎNA 9 SALÎYA KOÇI DIWAYÎ YA MISTEFA BARZANÎ

Di 27. 02. 1988'an de ji alî Partîya Demokrat Kurdistanî Iraçê, li Stokholmê ji bo bîranîna Mistefa BARZANÎ civînek hat amade kirin. Her di eynî civînekê de Îdrîs Barzanî jî hate bi bîranîn.

Di vê civîna bîranînekê de gelek kurd û nunerên hêz û partiyên siyasî yên kurdan beşdar bûn. Li ser navê Federasyonê jî hevaleyê di vê civînekê de hazir bû.

Li dumahîkê filmek li ser Kurdistanî Iraçê hate nîşandan.



Qazi Mohammed

Mustafa Barzani.

**Komela Kurdistanê li Uppsala piştgiriya xwe li gel girtiyên girtîgeha Diyarbekrê diyar dike.**

**Berxwedana girtîgeha (Zîndana) Diyarbekir ser firaziya me ye jî**

Dijmin, zulm û hovîtiya xwe ranawestîne. Lê belê gelê Kurd di qada jîyanêde di ber xwe dide û sengerên nû avadike. Ji bo şerê xwe yî azadi û rizgariyê. Ji van berxwedana yek jî berxwedana girtîgeha Diyarbekrê bû, ku şoreşgerên Kurd di roja 29.01.1988-an dest pêkiribûn.

Komela Kurdistanê li Uppsalayê jî erkê ser şanê xwe dizane ku her berxwedan û serî hildanên li Kurdistanê dest pêdikin û pêk tên li gel be û piştgiriya xwe diyar dike. Ji ber vê yekê jî, Komela Kurdistanê li Uppsalayê, ji bo piştgirtiya girtîgeha Diyarbekrê van aktivîtan ku li jêr hatine diyar kirin pêk anî: Roja; 19.02.1988-an Komela me li gel endamên xwe çû broya "Uppsala Nya Tidning" doz kir ku redaksiyona "UNT" ê li gel wan danîşe. Piştî runiştandina bi redaksiyonê re, daxwaz kir ku "UNT"e;

a) Berxwedana di girtîgeha Diyarbekrê de bighîne xwendevanên xwe û piştgiriya xwe li gel berxwedanê diyar bike û awira giştî bi dengê berxwedanê agahdar bike.

Piştgirî bi girtiyên  
Diyarbekrê re

b) Ev daxwaz û protestoya me di rojnamêde binivîse û ev xeber derbasî hemû ajansa bibe. Her wiha redaksiyonê ev daxwazên me qebûl kir. Ê roja din wek artîkelekê di bin nexşîşana (Xerîta) Kurdistanê de bi rojname xwe de nivîsand û weşand. Dîsa eynî rojê; ew endamên Komelê piştî ku ji UNT-ê vegeyriyan çûn Uppland radio'yê ew daxwazên xwe ji bo radio'yê jî diyar kirin. Ev daxwaz ji aliyê wan ve jî hat qebûl kirin û radio'yê li ser rewşa girtîgeha Diyarbekrê programek amade kir û her wisa jî bi navê Komelê hevlekî li gel radio'yê hevbevinek (Ropartaj) pêk anî.

Kurdên ku li Uppsalayê dijîn bi van her dû aktivîtan kefxweş bûn û her wisa jî bi vê riyê dengê berxwedana Diyarbekrê gihîşte gelê Uppsalayê.

## Musabaka Pingponê Li Uppsalayê

Komela me di roja; 06.03.1988-an di nav endamên xwe da musabaqa pingponê amade kir û pêk anî. Ji endama ew kesên ku divê babetê de bi xwe bawer bûn beşdarî musabaqê bûn. Hejmara van kesên bi xwe bawer jî 12 bûn. Ev musabaqa bi agengekî bi rêkûpêk, bi dostanî û hevalbendî pêk hat. Piştî dawî anîna musabaqê Komelê hevalên yekemîn, duemîn û sêyemîn xelat kir. Hemû kesên ku di musabaqê de wek mêvan û wek sportmen beşdar bûbûn, diyar kirin ku ev cûr aktivîte di nav Kurdan de dostanî û hevalbendiyê xurtir dike. Ê divê her tim aktivîtan wuha bête berdewamkirin. Komîta Karger ya Komelê biryar da ku salê du caran musabaqên pingponê amade bike. Her wisa biryar hat girtin ku pişniyarek bête kirin, ji bo Federasyonê, ku Federasyon pêşengiya amadekirina musabaqeke giştî ya pingponê di nav hemû kurdên li Swêd dijîn de bike.

## KANIYA DILAN

**Ev film ji aliyê rejîsorê kurd Mahmut Baksî ve hatiye çêkirin. Di 26.03.1988, seet 15.30 an de, di Televîzyona Swedê Kanala 1 (TV 1) ê de tê nişandan.**





## Li Uppsalayê

Seksiyona jina ya Komela Kurdistanê li Uppsala bi munasebeta 8-ê Adarê şevê di roja 04.03.1988-an de li darxistin. Di şevê de 250 kes beşdar bûn. Gelek organîzasyonên Swêdî û biyanî bi nûnerên xwe di şevêde hatin temsîl kirin. Seroka seksiyona jina di axaftina xwe de cîh û girîngiya jinan di nav civatê û di şerê rizgarî û azadiyê de çîye diyar kir. Axaftin bi kurdî û bi Swêdî pêk hat. **Şevê** bi ahengeke xweş hata wexteke dereng dom kir. Xwarina Kurdî, Grûba Silîva li gel Kulîlk û Azad bi stranên gelêrî û folkloro zarokan reng dan vê şevê û şev xemilandin. Tevayiya beşdaran bi dilxweşî û kefxweşî ji salonê derketin. Her weha seksiyona jina ya Komela me, li gel jinên Swêdî, Grêkî, Erîtrî û neteweyên din di roja 8-ê Adarê de şeveke navnetewî pêk anîn di vê şevêde folklor û muzîka Kurdî hate pêşkêşkirin. Di lokala şevê de pêşxistineke destkirên kurdî cîh girt. Li ser navê seksiyona jina, seroka seksiyonê bi swêdî axaftinek pêşkêş kir. Aktîvbûna jinên Kurd, bala beşdaran şevê gelek kişand. Şev bû platformeke dostanî û hevalbendiyê

**Zinar Bradost**

Sekreterê Komela Kurdistan li Uppsalayê

8'ê Adarê  
Jinên Kurd  
roja xwe ya  
navnetewî  
pîroz kirin

## Li Stokholmê

Li Stokholmê, li meydana Sergelstorg bi munasebeta 8'ê Adarê, Roja Jinan ya Navnetewî hat pîroz kirin. Li gel jinên Kurd gelek kes beşdarî vê pîrozkirinê bûbûn. Wekî tê zanîn her sal di 8'ê adarê de bi alîkariya "Komela 8'ê adarê," roja jinan tê pîrozkirin. Ev komel bi alîkariya 25

